



Rastiyên Dîrokî.. û Rêya Yekane li ber Kurdan

Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)

Di liv û meşa dîroka mirovayetiye da tevlihevî tine ye. Lê belê hin rastiyên bingehîn serdariya wê dikan, li ser wê hukumdarin û pêra hem rêya wê û hem jî çarenûsa neteweyan diçespînin. Ji lewra gelek girînge, ku mirov li dîroka cîhanê vegere û pendan jê wergire, ji ber ku dema derbasbûyî ji dema niha û ayendê bi ti awayî nayê birîn. Birêz *Gaston Botol* gotiye: “*Ya girîng ewe, ku tu zanibî bahoz ji kîjan alî va tê, daku tu xwe neavêjî ber lehiya wê û bi lê da neçî⁽ⁱ⁾*”. Ji lewra pir girînge, em wek Kurd, aliyê ku bahoz û bapeşk jêva dihat û niha jî jê tê, aliyê bahoz rastiyên dîrokî baş nasbikin û xwe neavêjin ber wê. Ew rastî jî evin:

Çar Rastiyên Dîrokî

Rastî (1): Şerkirin li ser Erdnîgariyê: Birêz *Maurice Duverger*

dibêje: “*Erdnîgarî dota dîrokê ye, bi qasî ku dayîka wê ye jî*”⁽ⁱⁱ⁾. Ev rastî ye, û gava erdnîgariya neteweyekê tê talankirin, netewe bi dawî dibe. Hên ji destpêka dîrokê da şerê di nav mirovan da li ser erdnîgariyê ye û hên jî ev şer berdewame. Ji ber pîrbûna gelha her welatekî, ev şer wê hên jî tundtir bibe û di siya vê rastiyê da, em dikarin, ev şerên ku niha pêketî ne jî şîrove bikin. Hevrikî û bizava hêzên mezin ku herdu polên erdê têxin bin serdariya xwe û herwisa gera li esman û bizava ku xwe bigihînin exterên din jî dîsa ji bo vê yekê ye.

Rastî (2): Bidestxistina Hêz û Şiyanê: Ji bo destxistina erdnîgariyê û parastina wê du şeweyên hêz û şiyanê pêwîstin: Hêza parastina erdnîgariyê û hêza bi tirs û sawîr ji bo vegirtina wê. Siyasetmedar û rêberên mezin, di dîroka mirovayetiya da, girîngî û hebûna hêzê dubarekirine. *Machiavelli* gotiye: “*Bihurîna dîrokê ji me ra çespandiye, ku pêximberên hêz û çek bikaranîne serkevtî bûne, lê belê pêximberên bê hêz û çek têkçûne*”⁽ⁱⁱⁱ⁾. Li gor dîtina filosofê almanî *Friedrich Hegel*: “*Maf divêt bi hêzê bê pêkanîn - di rastiyê da - maf hêz bi xwe ye*”^(iv). Filosofê almanî *Friedrich Nietzsche* jî diçespîne, ku “*pirs pirsê hêzê ye, ne pirsê*



mafe^(v). Dibêjin ku *Napoleon* gotiye: Cihê ku agirê topên te digihîniyê, serdariya te heyânî bi wire.

Rastî (3): Yekbûna Nawenda Siyasî: Her neteweyek nikare bi hêz bibe, heger di bin sîwana nawendekê da nebe yek. Her gelek ku di warê dîtin, armanc, helwest û daxwazan da ne yek be, nikare bi hêz û xurt bibe û nikare di ber hebûna xwe û welatê xwe da berevaniyê bike. Niha pirs ewe, ku çawa yekbûna nawenda siyasî (rêveberî) pêktê? Zanayên civaka her gelekî wê nawendê avadikin û ewin, yên ku dikin çanda neteweyî di nava gel da rahên xwe berde, ewên jî yên ku hişyariya neteweyî dikin malê gel, û wisa giyanê neteweyî diafirînin. Ew dîtina neteweyî ya hevbeş û daxwazên neteweyî li hev dihûnin û wisa tevaya gel dikin xwedî ten û laşekî çandî, siyasî, aborî û leşkerî.

Ev rewşa jî ewe, ya ku *Pêximber Mihemed* û hevalbendên wî di nav êl û eşîrên Ereban da di destpêka sedsala 7-an ya zayînî da pêkanîn. Ev rewş bi xwe ye jî, ya ku *Cengîzخان* di nav êlên Mixûl û Teteran da di destpêka sedsala 13-an da pêkanî, û wisa jî ya ku *George Washington* û hevalên wî li Amerîka di sedsala 18-an da afirandin.

Rastî (4): Avakirina Dewletê: Dewlet ne bi tenê ewe, ku ji



saziyan pêktê; dewlet hişyariya tevayî ya neteweyê dinimîne. Ew haşê tevayî yê avakirî ye, ku di saziyan da tê xuyakirin; ew nimayendeyê yekeme ji bo "Eza Neteweyî/Niştimanî", ji bo "Vîna Neteweyî/Niştimanî". Dewlet zirxê parastina hebûna neteweyê û nasnameya wê ye. Her gelekî ku dewlet pêkneaniye, di destê hêzên kolonyalîst û dagîrker, yên cihanî û herêmî da bûye lîstik.

Her zanayekî dîrokî ku bi mijara neteweyan ra xerîk bûye, herdem dewlet wek hêmanê herî girîng dîtiye. Em ji pendên *Konfoşyosê Çînî* (479 b.z.) ji siyasetmedaran ra destpêbikin, di *Aflatonê Yûnanî* (347 b.z.) û pirtûka wî "*Komar*" ra derbas bibin heyanî em digihînin *Friedrik Hegel*-ê almanî (1831) yê ku dewletê wek "*xudayekî ku li ser zemînê dimeşe dibîne*"^(vi).

Rêya Yekane ya Kurdistanî:

Ji ti kesî nayê veşartin, ku rêya neteweya me ji 25 sedsalan û bi vir da, li gor neteweyên cîran, rêyeka susret û bi fêşe. Û Nayê veşartin, ku pirsgirêka me ya bingehîn ne standina mafê hemwelatîyê di nav dewletên dagîrkerên welatê me da ye. Pirsgirêka me ya bingehîn parastina

nasnameya me û hebûna me wek neteweyekê ye. Ev pirseka hebûn û tinebûnê ye. Bi gotineka din: Ev pirsarastinê di ber mirovayetî, azadî, nirxên me û payedariya me da ye. *Jean-Jaques Rousseau* gotiye: “*Destberdan ji azadiyê wek destberdan ji wê yekê ye, ku tu mirovî yan na*”^(vii).

Rêyeka din li ber me nîne, ku tenha em berevaniyê di ber hebûna xwe da wek netewe bikin. Pilanên nû yê bîndestkirina herêma Rojhilata Navîn bi rûyên xwe yê farisî, turanî (turkî), erebî û erebkirî, bi xwe dûndayên pilanên talanên kevin û berê ne. Rêberên van pilanên nû bi serhişkî dixwazin ku welatê me hên di bin dagîrkeriya wan da bimîne, em her kole û bîndestên wan bin. Niha jî destpêkirine, ku pilanên xwe yê firehkirina qada xwe ji nû da bi kiras û xeftanekî îslamî vedijînin, daku bi van tewran dîsa nêçîrvaniyê li me bikin. Tevî ku dibêjin hemû misilman birane, lê belê, ew har û şêr dibin, hema gava em daxwaza Mafê Çarenûsa xwe dikin. Yan jî bi tenha gava em dixwazin navên gund, bajar û warên bav û kalên xwe vegeînin, ku wan bi pilanên fariskirin, turkkirin û erebkirinê guhertibûn.

Belê rêyeka din li ber mê nîne û ne jî dem ji xew,



xilmaşbûnê ra maye, ku em têkevin daf û xefikên sozên wan yên derewîn. Ramanên rêberên van pîlanên talanker, yên nû, bi çanda talan û dagîrkeriyê, bindestkirina gelan, pişaftina çand, nasname û hebûna wan dagirtî ne. Gelek nîşan ji wê yekê ra hene, ku heya niha di bîr û ramanên wan da ti cih ji bingehên demokrasî, federasyon û konfederasyonê ra tine ye. Ew wek pêşiyên xwe yên talanker bi hildana durîşmên boyaxkirî û derewîn gelek jîrin, lê di hinavên wan da kîna reş hildivêje.

Pêşiyên me yên Mad serdarên Rojavayê Asiya yên bê hempa bûn, Ê ew bûn yên ku hemû gelên Rojavayê Asiya ji bin nîrê zordariya Împaratoriya Aşûrî rizgarkirin, asayîş û aşîtî li herêmê bi giştî peydakirin. Ê berî wan pêşiyên me yên Gutî, Hûrî û Mîtanî ji hêzên herî xurt li vê herêmê bûn. Ev jî tê wê wateyê, ku em ne neteweyeka bê rah û dîrokin. Ji ber wê jî, em di warê dîrokî da namzetên wê yekê ne, ku em bi rola xwe ya rizgarî û çandî di vê cîhanê da rabin. Em di warê dîrokî da namzetên wê yekê ne, ku em bi tundî di hilweşandin û rakirina çanda tanlakirin, bindestkirin û pişaftina gelan da li vê cîhanê, beşdar bibin.

helbet bi tenha "xwe pesindana bi bav û kalan"



ayendeka ronak ji gelan ra ava nake. Daku em rêya meşa neteweya xwe ya dîrokî sererast bikin, û em cihê xwe dîsa di bin roja dîrokê da vegeînin, pêwîste em hesabê van çar rastiyên dîrokî bikin:

- Parastina Erdnîgariya Kurdistanê
- Bidestxistina Hêza Kurdistanê ya Tund
- Pêkanîna Nawenda Siyasî Kurdistanê ya Yekbûyî
- Avakirina Dewleta Kurdistanê ya Serbixwe

Şerê Navbera Gelên Çiyayî û Gelên Biyabanê

Pirsgirêka kurdî ne tenê encama peymanana Saykês-Pîko (Sykes-Picot) ya sala 1916-an, ne jî tenê encama şerê û peymanên navbera herdu împêratoriyên Osmanî û Sefewî ye, û ne jî tenê encama talankirina erebî ji Kurdistanê ra di sedsala 7-an da ye. Ev mijara me bi pirî ji wê kevintire, ew vedigere dora 4000 sal b.z. Ev diyarde rûyekî kefteleft û şerê navbera gelên çiyayî û gelên biyabanê li ser erdnîgariyê ye. Di eynî demê da, ew berdewamiya keftelefta navbera çand, bîrewerî û siyaseta van herdu aliyane; yanê ya gelên çiyayî û gelên biyabanan. Berî ku em li çand, bîrewerî û siyaseta bikolin, ka em dest bi erdnîgariyê bikin, ji ber ku



çand, bîrewerî û siyaset herdem bi erdnîgariyê va girêdayî ne.

Şer û Keftelêfta li ser Erdnîgariyê:

Hên di berbanga dîrokê da herêma here girîng di Rojhilata Navîn da, herêma navbera Perava Somerî (Perava Farisî) û Biyabana Erebî ji hêla başûr va heya bi Derya Reş li bakur û Textê Çiyayî yê Ariyanî ji rojhilat va heya bi Derya Sipî li rojava bû. Ev herêma ku em qala wê dikin, di dema niha da ji welatên Fars, Kurdistan, Azerbeycan, Ermenistan, Turkiya, Îraq, Sûriya, Libnan, Felestîn û rojavayê Urdin pêktê. Ev herêma ku hincaran "Welatê Heyvê yê bi Xêr û Bêr" jêra tê gotin, dergûş û landika şaristaniyê li rojavayê Asiyayê bû. Şaristaniya Guzana, ku wek Şaristaniya Helef jî tê binavkirin (Helef navê girekî dîrokî ye li nêziya bajarê kurdan Serê Kaniyê) kanî û maka wê ya here navdar bû. Lê belê ev şaristanî di navbera sedsalên 4400 heya 4300 b.z. da ji arê (meydanê) hate rakirin û winda bû^(viii).

Hên ji wê demê da hevzoyê başûr yê çemên Dijle û Ferat (Mêzopotamiya) û deştên Sûriyayê meydana keftelêft û şerê navbera gelên çiyayê Zagros (pêşiyên Kurdan) û



gelên ku pirtûka Tewratê ew bi nav (Samiyan) dane nasîn, w n ku ji hêla Biyabana Erebî û Beriya Sûriyayê va ber bi bakur va kişiyabûn. Gelê Somerî, gelê herî kevin bû, ku ji şaristaniya Guzana, ji çiyayên Zagros hatibû û li deştên başûrê Mêzopotamiya bi cih û war bûbû; ji ber ku axa wir avî û bi xêr û bêr bû. Wan li wê herêmê şaristaniya here gewre ya rojavayê Asiya ya navbera salên 2800 heya 2370 b.z. avakir.

Li Rojava û başûr-rojavayê Mêzopotamiya hin êl û eşîrên revend li beriya Sûriyayê û biyabana welatê Ereban digeriyan. Ew herêm erdnîgariya birçîbûnê bû û wisa wan êlên revend talan dianîn herêma Mêzopotamiya û deştên Sûriyayê, ku erdnîgariya têr-tijî û bi xêr û bêr bû; erdnîgariya dewlemendiyê bû.

Li dora salên 2500 b.z. êlên Ken'anî gihîştin Felestîne û êlên Akkadî gihîştin Mezopotamiya. Ew di destpêkê da bi rêya kar û parsê ketin nava civata Somerî û di pêy ra, gava hin şer û berberî di navbera bajarên Someran da peydabûn, derfet û fersend dîtin, bi serokatiya *Sargonê Yekem* hêzên xwe kirin yek, welatê Someran xistin destê xwe, êdî ew bûn xwediyên welêt û wisa cara yekem dewleteka navendî bi




navê Padîşahiya Akkad ji salên 2370 heya 2230 b.z. avakirin. Wan piraniya Îraqa niha xistin bin destên xwe û êdî talan birin çiyayên Zagros û ser Padîşahiya Êlam ji^(ix).

Lê belê gelên Zagros bi rêveberiya gelê Gotî bi tundî li hember Akkadiyan rabûn, pîştî demekê zora wan birin, talan ajotin ser Mezopotamiya û wisa welatê Someran ku ketibû bin destê Akkadiyan di salên 2230 heya 2120 da xistin bin serdariya xwe. Di pey ra gelên herêma Somerî-Akkadî careka din bi hêz bûn û Gotî vegerandin herêmên wan yê çiyayî. Ev serhildan bi rêveberiya padîşahê Somerî *Ur-Nammu* bû; salên 2112 heya 2095 b.z. Ev Padîşah avakerê Padîşahiya Ur ya Sêheme (2112 - 2004 b.z.)^(x).

Li dora salên 2000 b.z. êlen revend yê Amurrî Samî ji bakurê biyabana erebî, belkî jî, ji beriya sûrî ber bi bakurê Sûriyayê va kişyan, û şopek din ji wan ket herêma Mêzopotamiyayê. Van êlên Amurrî li Mezopotamiya padîşahiya Babil ya yekem avakirin. Yek ji padîşahên wan yê navdar *Hemorabî ye (Hammurapet)*. Di pey ra êdî êrîş û talan birin çiyayên Zagros. Lê belê wê demê êlên Kaşî yê Ariyanî gihîştibûn herêma rojavayê Asiyayê û di nav gelên Zagrosan wek Êlamî, Gotî, Lolobî û Sobarî da hêz û şyan

vejandibûn. Ew li hember Babiliyan derketin, zora wan birin û bajarê Babil jî dora şeşsed sal (1741 heya 1157) xistin bin serdariya xwe^(xi). Piştî dema Kaşiyân, Kildanên Samî bûn hukumdarên Babil.

Piştî wê demê bi sedsalan kefteleft û şerê li ser axa Mêzopotamiya û Sûriyayê di navbera gelên Arî yên çiyayên Zagros û gelên biyabanan yên Samî da berdewam kir. Bi encama van êriş û talanan û têteliya di navbera Samî û Ariyan da, li bakurê Mêzopotamiya, li bajarê Aşûr û derdorên wî gelekî (miletêkî) têtîl ji Samî û Horiyan, bi çand û serdariyeka Samî peyda bû^(xii).





Wan împatoriyeke har û êrişkar avakir û di pey ra hêza wan li M zopotamiyayê da ser hêza Babiliyan, êriş û talan birin warên pêşiyên Kurdan wek Sobarî, Horî/Mîtanî, Manayî, Xaltî (Urartu) û Medan. Hukumdariya Aşûriyan hukumdariyeka zordar û xwînrêj bû. Dawiya dawî, gelên çiyayên Zagros, pêşiyên gelê Kurd, bi rêveberiya Medan û piştgiriya Babiliyan împatoriya Aşûr sala 612-an b.z. hilweşandin, û wisa ew û hevalbendên wan Babilî (Keldan) bûn serdarên rojavayê Asiyayê^(xiii).

Li hêla din deştên bakurê Sûriyayê û kenarên Derya Sipî bûbûn meydan û tirada keftelefta navbera gelên çiyayî bi rêveberiya Horî/Mitaniyan û gelên beriya Sûrî yên Aramî. Lê belê gava derdora salên 1360 b.z. împatoriya Hitî Paytextê Mîtaniyan Waşokanî (Serê Kaniyê) vegirt, Aşûriyan ji bakur û rojhilat da warên Mîtanî/Horiyan xistin bin serdariya xwe û mîrîtiyên wan yên biçûk bi xwe va girêdan^(xiv). Bi vî awayî, li dora salên 1100 b. z. meydan ji Aramiyan ra vekirî ma.

Rêyên Bazirganiyê yên Cîhanî:

Sedemên şer û keftelefta gelên çiyayî û gelên biyabanê li



ser herêma Mêzopotamiya sedemên aborî û geo-siyasî bûn, ji ber ku di vê herêmê ra du rêyên bazirganiyê yên cîhanî derbas dibûn:

1- Rêya Hevreşîm (herîr): Rêya Hevreşîm damara bazirganiya cîhanî bû, ku ji welatê Çîn destpêdikir, di navenda Asiya û bakurê Textê Çiyayî Ariyanî ra derbas dibû, ji wir li hinda bajarê Rege (Rey, nêziya Tahrana niha) ber bi başûr va xwar dibû, dihat Akbatana (paytextê Medan, Hemedana niha) û di başûrê Kurdistanê ra dihat heya welatê Somer û bajarê Babil (nêziya Bexdada niha). Ji wir ev rê êdî dibûn sê rêyên sereke:


- Rêyek ji wir dihat heya bajarê Palmîra (Tedmura niha) û pêra digihîşte Hums û kenara Sûrî (Derya Sipî).

- Rêya duwem ber bi başûr va dihat, başûrê Urdin û Felestînê derbas dikir, bi rêya deryayî, di Derya Sor ra û bi rêya hişkayî, di biyabana Sinayê ra digihîşt Misirê.

- Rêya sêhem ji Babil dihat heya bajarê Heřanê (li nêziya Urfaya niha), ji wir dadiket bajarê Kerkemîş li ber Ferêt û ber bi rojava da diçû heya kenarên Derya Êgge (Îcce). Iskel û bajarên li ser Derya Sipî, di warên bazirganî, çandî û siyasî da bûbûn navendên têkiliyê di navbera seranserê Asiya û

Ewropayê da.

2- Rêya Pixûrê: Rêya pixûr û biharatan damareka din ya aborî cîhanî bû. Vê rêyê ji Rojhilata Dûr, ji başûrê welatê Çîn destpedikir, di ber kenarên welatên başûrê Asiya ra dihat heya îskelên başûrê welatê Yemenê. Ji wir ber bi bakur va di Hîcazê ra, di ser bajarên wek Mekke û Yesrêb (Meddîne) ra dihat heya başûrê Urdinê. Ev rê jî li wir dîsa dibûn sê rê:





- Rêyek diçû navenda Mêzopotamiyayê.
- Rêya din di Felestînê ra dihat hundirê Sûriyayê û kenarên wê li ser Derya Sipî.
- Rêya sêhem di biyabana Sinayê ra bi rêya hişkayî diçû Misirê.

Nexşeya Geo-Siyasî ya rojavayê Asiyayê di wê demê da berî ketina împêratoriya Medan sala 550 b.z. bi wî awayî bû. Di rewşa wê demê da bi gelemperî bidestxistina erdnîgariyê ji bo armancên aborî û geo-siyasî hewceyî sê hêmanên girîng bû, ku bi hev ra pêkbên û li gel hev biguncin:

- 1- Diviyabû rêveberiyeka zana, tund, hişk, û pir caran fêlbaz û xwedî biryar hebe, ku dîtina wê ya stratêgî pragmatîk be, bi pîlan û tedbîr be, bikaribe gel organîze bike û pîlan û projeyên xwe bi çalakî û huner pêkbîne.
- 2- Diviyabû xwedî hêzeka leşkerî pir bi rêk û pêk, bi bawerî be, li gor fermanên rêveberiyê tevbigere, bi sihêt (tecrûbe) û bi heybet û suř be, hem fedakar be û hem jî teknîk û rêbazên here baş û nûjen (yên dema xwe) bi kar bîne.
- 3- Diviyabû hem rêveberî, hem leşker û gel xwedî yek bîr û bawerî bin. Ev bîr û bawerî hem di wê demê da û hem jî di



demên piştî wê da bi olê (diyanetê) pêkdihat. Olên wê demê û yên piştî wê, yan pir-Xwedawend bûn, xwedawendekî/ka gewre di nav wan da hebû û di perestgehan da digihîştin hev (Pantheon); wek xwedawend *Merdox* li Babil û wek xwedawend *Jupiter* li Ba Romaniyan. Yan jî yek Xweda bû, ku xwedayekî din li hember wî tinebû. Ev yek Xweda hin caran taybetiyeka neteweyî li ser hebû; wek Xwedayê *Aşûr*, wek *Yehwe*; yan jî taybetiya cîhanî didan ser; wek Xweda li ba Xirîstiyanan û Xweda (Allah) li ba Misilmanan.

Daku em dîroka Kurd û Kurdistanê bi giştî û gelemperî têbigihînin û bi taybetî wan demên, ku Kurdistan ket bin serdariya Xîlafeta Erebi-Îslamî, divêt em li gor van rastiyên dîrokî û geo-siyasî lê temaşe bikin û ji wir da em lêkolîneka kûr li pêwendiya navbera bidestxistina erdnîgariyê û çand û siyasetê da bikin. Em li gor wê lêkolîna xwe li helwesta Îslama Siyasî ya niha ji doza Kurd û Kurdistanê, bikin û têbigihînin.

Wergera Ji Erebi: Mustefa Reşîd

Jêder:

- ⁱ Gaston Botol, hunera siyasetê, rûpel 103.
- ⁱⁱ Maurice Duverger, zanyariya civaka siyasî, rûpel 56.
- ⁱⁱⁱ Nicola Machiavelli: Pirtûka MÎR, rûpel 82.
- ^{iv} Herbert Fischer: Dîroka Ewropa di dema nû da, rûpel 203.
- ^v Friedrich Nietzsche: Mirovekî têper di mirovatiya xwe da, 1/196.
- ^{vi} Geofrie Roberts: Ferhenga Nû ya şîrovekirinên siyasî, rûpel 340.
- ^{vii} Glean Tender: Ramana Siyasî, rûpel 162.
- ⁸ Jems Milart: Şaristaniyên here kevin li Rojhilata Nêzîk, rûpel 157.
- ⁹ Reniye Labat û hinên din, xelesa efsaneyên Sûrî, rûpel 14.
- ¹⁰ Sptino Moskati: Şaristaniyên Samî yên kevin, rûpel 96. William Langer: Dîroka Cîhane 1/55.
- ¹¹ Jin Potro û yên din, rûpel 213, Diyaknov: Madi, rûpel 127. Mohamad Biyomi Mihran: Dîroka Îraqê ya kevin, rûpel 304-307
- ¹² Wool Diorant: Çîroka Şaristaniyê, 2/
- ¹³ Hary Sags: Mezinahiya Aşûr, r. 54. William Langer: Enseklopediya Dîroka Cîhanê, 1/60 - 61. Gernot Wilhelm: Horî, r. 79. Dyakonov: Meder, r. 205, 294
- ¹⁴ William Langer: Enseklopediya Dîroka Cîhanê, r. 1/84.